15ê Gulanê Cejna Zimanê Kurdî Pîroz Be

Em sozdarê wê rêyê ne ku ew rêya li ser yekîtiya zanîn û bawerkirina li ser Heq, gerdûn û mirovahiyê ye. Di baweriya me de gerdûn neynika Heq e, mirov jî neynika gerdûnê ye. Hemû hebûn û heyber ji heman hebûnê çêbûne û mirovê ku ji peydabûna hemû cîhanan pêkhatî jî weke hebûnek bêkêmasî, zana û bi keda destî saz dike û bi zimanî diaxive, di vê cîhanê de cihê xwe digire. Tevahîya hebûnê, xuyana hemû rastiyê ye ku bi hezar awayî xuya dike û yekîtiya razîbûn û îqrarê ye û xwedîyê maf e. Rastî û zimanên gelan ên ku bi hezaran têne îfadekirin şax û pelên dara mirovahiyê ne. Ew hemû rastiyên Heqî ne ku xuyane û li ser çerxa kamilbûnê ne û ew bi mafên xwe yên nayên nîqaşkirin jî hene. Bi boneya Cejna Zimanê Kurdî em dixwazin careke din diyar bikin ku her neteweyek, her zimanek di çerxa kamilbûn û pêşveçûnê de di tevahiya dîroka dirêj a mirovahiyê de bi kedeke mezin xwe afirandiye û her yek ji wan nirxên mirovahîyê yên kolektîf ji serdemekê heta roja îro hilgirtiye û anîye. Bi vî awayî gelek nirx jî bi her zimanekî ku tê bîr û hafizeya mirovahiyê û bi pişaftinê tê tunekirin re wenda dibe. Em dizanin ku gelek mirovên bindest û mazlûm bûne armanca vê riya bêhemd û bêîradeya xwe ku birînên kûr di dilê mirovahiyê de vebûne. Ev e sed sal e bi hişmendî û polîtîkayên Îtîhatparêz û tirkparêz, gelek gelên li Anatoliya û Kurdistanê yan hatine tunekirin an jî ji welatên xwe yên qedîm û kevnar hatine mişext kirin. Yek ji qurbaniyên van polîtîkayan gelê Kurd bûye. Klîkên hikûmeta Îtîhatparêz ku rastîya gelê Kurd bi tevahî hedef girtine, zirarek mezin dane rastîya gelê me. Civakên Elewiyên Kurd ên Raa/Reya Heqî, ji ber herêmên erdnîgarî yên ku lê dijîn, herî zêde bandor bi van polîtîkayên li ser gelê Kurd kirine, bûne beşa civakî ya herî zêde ji polîtîkayên asîmîlasyonê, ji polîtîkayên qirkirina fizîkî û sirgûnê bandor bûne. Îro hem civata kurdên elewî ya kirmanckî û hem jî kurmancîaxêv Raa/Reya Heqî bi giranî ji zimanê xwe yê zikmakî qut bûne. Bi

taybetî kirmanckî li lîsteya zimanên dimirin zêde bûye. Di vê çarçoveyê de weke azwerên Raa/Reya Heqî ku hedefa bingehîn a asîmîlasyonê ne, divê em bi biryardarî li zimanên xwe xwedî derkevin û weke berê bi zimanê xwe yê zikmakî li ser rê-esas ên xwe bimeşînin.

Gel rastî ne û bi mafên xwe hene. Mafê rastiya gelê Kurd jî heye ku bi hemû rengên xwe rastiya xwe bijî û xwe ber bi siberojê ve hilgire. Ziman diyarkerên bingehîn ên gelan in, xezîneya hemû nirxên ku di dîrokê de berhev kirine ne. Wendakirina zimanekî tê wateya windakirina gel.

Bi boneya 15'ê Gulanê Cejna Zimanê Kurdî em bang li gelê xwe yê Kurd ê bi her rengî dikin ku zimanê me bi xurtî hembêz bike, di jiyana rojane de bi kar bîne, sazî bike û ji bo ku zimanê me bibe zimanê perwerdehiyê û jiyana gel bi biryar têkoşîna demokratîk bilind bikin. Em Cejna Zimanê Kurdî li gelê xwe pîroz dikin.

Dem ne bêxwedî, cih ne bê razî, mezlûm ne bêçare ne!

Navenda Komeleyên Demokratîk ên Elewiyan